

ÇIYAYÊ QEREÇOX

Bextreşê Koçer

Qereçox : Bêjeyek ji du beşan pêk tê , Qere : ango reş , Çox : ango paç yan çox , bi girêdana van herdu bêjeyan bi hev ve , ev bêjeye wateya çoxê reş dide .

Di çarçoveya pelemara Erebkirina navên gund , bajar , newal û çiyayên Kurdî ji aliyê desthilata Sûryê ve , navê Qereçox hat guhertin bi Kiratşok .

Qereçox , gulokek çiyayê volkaniye bilindbûna wî dighe heya 700 m li ser rûyê deryayê , dikeve li başûrî bajarê Dêrika Hemko bi 15 km an . Qereçox ne gelekî bilind e û bilindbûnek nimiz heye , sebareti çiyayên Kurdistanê yê bilind û helemût wek Cûdî , Ararat , Sîpan û Qendîl ...H.W.D . Aliyê çiyê yê bakur deştek têr çem , newal û Kendal heye, jê re dibêjin Deşta Hesina. Li ser navê êla Hesina ya Kurd , ya ji zû de li wir jiyana xwe berdewam dikin bi nav bûye , û ev Deşta , Deştek gelekî fireh e, ji çiyê berdewam dike heya dighê Ava Mezin (çemê Dicle) , û piraniya herêma Dêrika Hemko bi dirêjahiya 75 km an û pehna 30 km î hembêzî xwe dike . Başûrî çiyayê Qereçox , xakek fireh û rast heya dighê çiyayê Şingalê, jê re dibêjin Berî. Û çiyayê Qereçox jî dirêjahiya çiyayê Bêxêre ye, yê dikeve başûrî Kurdistanê Turkiyê, lê navbirek dirêj ji hejmarek girên nizim, Kendal , newal û çemê Dicle dikeve navbera wan. Û çiyayê Qereçox ji gundê Beroj dest pê dike heya dighê gundê Xana Serê û dîsa piştî navbirek kin ji Gundikê Şêxê Dîn berdewam dike û di rojava de nizim dibe heya dighê herêma Aliyan û dawiya wî dîsa dibe deştek têr çem û newal û Kendal .

Li ser serê wî raserî Gundikê Şêxê Dîn darek mezin ya Berûya bergirtî ji dehên salan ve lê heye, jê re dibêjin dara Hesê. û dibêjin mezinek herêmê bi navê Hesê ew dar bi destê xwe çandiye .

Nîşanên dîrokî hene û peyda dibin ku Qereçox û herêma xwe avane , û tevgera élan tê de peyda dibe di destpêka serdema misilmantiyê ve, û xelkên herêma Qereçox ji kurmancên Êzidî bûn ji êla Musûsan lê di

kurmancên Êzidî bûn ji êla Musûsan lê di çarçoveya şerên belavkirina misilmantiyê di herêmê de , Êzidî ji herêmê kişyan û çûn xwe li çiyayê Şingalê girtin.

Û tê zanîn ku du şerên mezin û kavilker di navbera Êzidiyan û êla Mîran de derbûne ji berya 250 salan li hawîrî çiyayê Qereçox , şerê yekem li girê seryan nêzikî gundê Xanikê yê neha dikeve li ser keva Dicle û şerê duyem li gundê Til Xenzîr yê dikeve başûrê Qereçox bi 7 km ran , û di van herdu şeran de dehên kesan hatine kuştin ji herdu aliyan û hê heya neha jî gorên 71 qurbanîyên van şeran xuyane di goristana Xenco de nêzikî gundê Beroj yê di keve di keva çiyayê Qereçox de , û ev herdu şere nîşanên dîrokî li ser Kurdayetiya çiyayê Qereçox û herêma hawîrdor û hebûna Kurdan di herêma çiyayê Qereçox de . Û Qereçox di serdema Osmanîyan de bi Mîrgeha Botan ve girêdayî bû , ya sînorê wê yê aliyê başûr digiha heya çiyayê Şingalê û piştî hevpeymanî Saykis Bîko di sala 1916 an de û levakirina Kurdistanê li ser çar Dewletan û her wesa Mîrgeha Botan jî hate parçekirin û beşê wê yê başûr hate girêdan bi Dewleta Sûryê ve û çiyayê Qereçox kete di hundirê sînorê Dewleta Sûryê de. Û hejmarek bûyer di herêma Qereçox de çêbûne ji wan bûyeran . Dibêjin : Hême bekê Şikakî û êla xwe ji Kurdistanê rojhilat hatine û demekê li herêma Qereçox rûniştine û kevne warên wan li gundê Hême Bekê yê neha , di hatin xuyakirin heya demeke ne dûr jî , û dibêjin sedema hatina wan li herêma Qereçox , ji ber berdewambûna êriş û dest dirêjiyên leşkerê Şah piştî şerê Dimdim di sala 1608 an de li ser êla wan . Û dibêjin di nav êla Şikakan de şivanek ciwan hebû , ew û dotmama xwe evîndarê hevbûn û carek ji caran çavdêriyê li destgirtiyê xwe dike û li ser latek bilind di raweste û stirana li ser destgirtiyê xwe dibêje bi dengê bilind û zelal û rind û xweş , û zilamek yê Mîrê Botan lê rast tê û dengê wê dibêze û ji dengê wê dimîne matmayî û diçe ji Mîrê Botan re dibêje : Mîrê min : min îro keçikek Şikakî dîtiye li ser destgirtiyê xwe di stirand bi dengê xweş û zelal û nazik û min weke vî dengî xweş û zelal û nerm li tu deverên **D.R.4**